

Ji Edîtorî

Ji Nûbihar Akademîyê merheba!

Em bi hejmara bîst û yekem a kovara *Nûbihar Akademîyê* li pêşberî we akademîyen û vekolerên hêja ne. *Nûbihar Akademîya* ku deh salên xwe temam kirine bi vê hejmarê ket sala xwe ya yazdehem. Em bi kêfxweşî dixwazin ragihînin ku kovara *Nûbihar Akademîyê* di vê qonaxa weşana xwe da di qada niwanesazîyê da (îndeksing) gaveke girîng avêtîye û ji alîyê du sazîyên niwanesazîyê yên bawerpêkirî ve qebûl wergirtîye (MLA û EBSCO). *Nûbihar Akademîyê* bi vê serkeftinê di kovargerîya zanistî ya nêvdewletî da pileyeke nû bi dest xistîye û ji bo serkeftinê nû jî berhêvî bûye.

Di vê hejmarê da pênc gotarên di babetên giştî da û du gotarên li ser babeta do-sayayê (Edebîyata Soranî di Sedsala XXem da) cih digirin. Ji alîyê qadan ve sê gotar di qada edebîyatê da her çarêن mayî jî di qadêن ziman, dîrok, antropolojî û sosyolojîyê da ne. Ji alîyê ziman ve çar gotar bi kurdîya kurmancî, yek bi kurdîya soranî, yek bi îngilîzî û yek jî bi farisî ye.

Şükrân Coşkunê, bi gotara xwe ya kurmancî ya bi sernavê “Plansazîya Zimên di Xebatêن Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de” besdarîya vê hejmarê kirîye. Li gor Coşkunê; plansazîya zimên ji bo geşedana zimanekî û bidestxistina standardekê xebateke zerûrî ye. Digel ku kurd kêmara herî mezin a Tirkîyeyê ne jî heta niha li Tirkîyeyê xebata plansazîya zimên tenê ji bo tirkî hatîye meşandin û ji bo kurdî tu gaveke fermî nehatîye avêtin. Ji ber vê yekê jî rewşenbîrên kurd hewl dane ku bi rîya avakirina hin sazîyan vê valahîyê dagirin û prestîja zimanê kurdî bilind bikin. Coşkunê li ser vê esasê şêweya plansazîya zimên ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê kirîye mijara gotara xwe û li ser vê plansazîyê analîzeke rexneyî kirîye.

Numan Yurtî, bi gotara xwe ya kurmancî ya bi navê “Elîfname di Edebîyata Kurmancî ya Klasîk de” di vê hejmarê da cih girtîye. Elîfname cureyeke helbesta klasîk e ku helbestvan tîpêن alfabeya kurdî-erebî esas digire û hîzr û hunera xwe bi şêwazeke taybetî û balkêş li ser wê ava dike. Yurt, di encama vekolîna xwe da ji nav metnêن edebî yên kurmancî şes elîfname tesbît kirine û li ser wan vekolîneke analîtîk meşandîye. Yurt bi awayekî serkeftî bi me daye xuyakirin ku gelek babetên nihêni yên helbesta kurdî ya klasîk li hêvîyê ne ku ji alîyê vekoleran ve bêñ aşkerakirin.

Hanifi Taşkın, di gotara xwe ya kurmancî ya bi navê "Mîrektiya Kêsanê" da li ser mîrektîyeke Kurdên Kurmanc a serdemâ Osmanî ku heta niha nedihat naskirin rawestîyaye. Taşkînê ku di sahayê da tibabek xebat kirine, xwe gihandîye endamên malbata mîrên Kêsanê û derheqê dîroka vê mîrektîyê da zanyarîyê destê yekem wergirtine. Hêjayî gotinê ye ku zanyarîyêng bingehîn ên li ser Keleha Sunbanê ya ku navenda vê mîrektîyê ye û di nîveka Bedlîs û Hîzanê da dimîne û yêng li ser mizgeft, medrese û dêra wê digel deşîfrasyona nivîstekên wan cara yekem e ku di vê gotarê da têng weşandin.

Serdar Şengül, di gotara xwe ya Îngilîzî ya bi navê "Literary Education And Wisdom Literature In Madrasa Cirriculum"ê da bi çavekî antropolojîk rola ku medreseyêng civakêng misilmanan di perwerdeya edebîyatê da lîstine raxistîye pêş çavan û bi taybetî jî ev alîyê medreseyêng kurdan ku heta niha nebûye mijara vekolînêng akademîk derxistîye pêş. Şengül di vekolîna xwe da gihîstîye wê encamê ku li nav kurdan medrese di heman demê da saziyêng perwerdeya edebîyatê bûn, di van medreseyan da metnêng edebî bi awayekî zerûrî lê wek beşike perwerdeya taybetî dihatin xwendin û xwendina van metnêng edebî yêng îrfanî nasnameyeke mirovnasiyê jî bexşı derçûyêng medreseyêng kurdan dikir.

Ömer Fırat Bavlî, di gotara xwe ya kurmancî ya bi navê "Qehwexane û Rewşenbîr: Tesîra Qehwexaneyêng Kurd Ên Stenbolê Li Ser Geşedana Neteweperwerîya Kurdi" da destnîşan kirîye ku qehwexane ji sedsala XVIem ve li rojhilata navîn mekanêng ser-cke yên jiyana civakî bûne û herweha di sedsala XIXem da jî navendêng hevgirtinê ûn Kurdên Stenbolê û qadêng bangeşeyê yên neteweperwerîn kurd bûne. Bavlî, di gotara xwe da rola ku van qehwexaneyan di geşedana nasnameya neteweyî û di jiyana rewşenbîrî ya Kurdên Stenbola wê serdemê da lîstine bi awayekî berfireh analîz kirîye.

Cihad Shukrî Rasheed gotara xwe ya bi farsî ya bi navê "În'îkasê Mezamînê Qelenderî der Eş'arê Saffî Hîranî" û **Pakhshan Sabir Hamad** jî gotara xwe ya bi kurdîya soranî ya bi navê "Ziman û Ezmûnî Muftî Pêncîwanî le Nêw Rehendî Roşinbîrî" da" di çarçoveya dosyaya vê hejmarê da (Edebîyata Soranî di Sedsala XXem da) amade kirine. Serperiştê dosyayê **Doç. Dr. Hemin Omar Ahmad** di pêşekîya dosyayê da li ser van gotaran zanyarîyêng pêdîvî pêşkêş kirine.

Dosyaya hejmara bê ya *Nûbihar Akademîyê* (hejmara bîst û duyem) dê li ser babeta "Medreseyêng kurdan" be û editörîya dosyayê dê ji alîyê Abdurrahman Adak û Şehmus Kurtî ve bê kirin. Bi hêvîya ku em bi naverokeke dewlemend û babetêng girîng li pêşberî we vekoler û akademîsyenêng hêja bin.

Bimînin di nav xêr û xweşîyê da.

Prof. Dr. Abdurrahman Adak
Editorê Giştî

Editorial

Greetings from *Nûbihar Akademî*!

We are coming up before you esteemed researchers and academics with the 21st issue of *Nûbihar Akademî*. *Nûbihar Akademî*, which has completed its ten years and entered its eleventh year with this issue. We would like to announce that *Nûbihar Akademîyê* has taken an important step in the field of indexing at this stage of its publication and has been accepted by two trusted indexing organizations (i.e. MLA and EBSCO). *Nûbihar Akademî* has achieved a new degree in international scientific journalism with this success and has been hopeful for new achievements.

This issue feature five articles on general topics and two articles on the subject of the file (Sorani Literature in the XX. Century). In terms of the fields, three articles are in the field of literature and the other four are in the fields of language, history, anthropology and sociology. In terms of language, four articles are in Kurmanji Kurdish, one in Sorani Kurdish, one in English and one in Persian.

Şükran Coşkun has contributed to this number with a Kurmanji article entitled "Language Planning in The Work of the Kurdish Institute of İstanbul". According to Coşkun, language planning is a necessary task for developing a language and achieving a standard. Although the Kurds are the largest minority in Turkey, language planning has been carried out only for Turkish language and no official steps have been taken for the Kurdish language. That is why Kurdish intellectuals have tried to fill this gap by building some institutions and raising the prestige of the Kurdish language. On this basis, Coşkun has discussed the language planning style of the Kurdish Institute of İstanbul and has made a critical analysis of this plan.

Numan Yurt is included in this issue in his Kurmanji article "Alifname in Classical Kurmanji Literature". Alifname is a type of classical poetry on which the poet is based on the letters of the Kurdish-Arabic alphabet and builds his thoughts and art in a special and interesting way. Yurt has identified six Alifnames from Kurmanji literary texts as a result of his investigation and conducted an analytical investigation on them. Yurt has successfully stated to us that many of the secret topics of classical Kurdish poetry are expected to be revealed by investigators.

Hanifi Taskin, in his Kurmanji article "The Emirate of Kesan", focused on an Ottoman-era Kurmanji Kurdish heritage that was not yet known. Taşkın, who has worked on the field, has reached out to members of the Family of The Princes of Kesan and has received first-hand information about the history of this emirate. It is worth mentioning that the basic information about the Sunban Fortress, which is the center of this heritage and is located in the middle of Bitlis and Hizan, and those on its mosque, madrasa and church, along with the deciphering of their writings, has been published in this article for the first time.

In his English article "Literature Education and Wisdom Literature in Madrasa Cirriculum", **Serdar Şengül** has anthropologically highlighted the role that Muslim community schools have played in literary education, and in particular has highlighted this side of Kurdish schools, which has not yet been the subject of academic research. In his research, Şengül has concluded that among the Kurds, madrasas were also literary education institutions, in these schools literary texts were read in a special education way, and the reading of these literary texts of wisdom also gave a sociological identity to the graduates of Kurdish schools.

In his Kurmanji article entitled "Coffeehouses and Intellectuals: The Impact of Istanbul Kurdish Coffeehouses on the Development of Kurdish Nationalism" **Ömer Firat Baylı** stated that coffee shops have been the main places of social life in the Middle East since the XVI. century, as well as were the solidarity centers of the Kurds of Istanbul and the call areas of Kurdish nationalists in the 19th century. In his article, Baylı extensively analyzed the role these coffeehouses played in the development of national identity and in the intellectual life of the Istanbul Kurds of that time.

Jihad Shukri Rasheed with his Persian article entitled "An Analysis of Qalandari Themes in Safi Hirani's Poems" and **Pakhshan Sabir Hamad** with her Soranî Kurdish article "Language and Experience of Mufti Penjweni (1881-1952) in The Cultural Dimension" feature as part of special file (Soranî Literature in the X. Century) of this issue. File Editor Assoc. Prof. Dr. Hamin Omar Ahmad has provided the necessary information on these articles in the file presentation.

The file for the next issue of Nûbihar Akademî (issue 22) will be on "Kurdish Madrasas" and will be edited by Abdurrahman Adak and Şehmus Kurt. Hoping that we will appear before you valuable researchers and academics with a rich content and important topics.

Best wishes.

Prof. Dr. Abdurrahman Adak
Editor-in-Chief